Dr Nûredîn Zaza
1919 - 1988

NEWROZ

Osman Sebrî
1905 - 1993

Xebat ji bo : * Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe.
* Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan.
* Mafên gelê Kurd yên netewî di çarçewa yekîtiya wel[êt de .

Ji *we\anên Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê - YEKÎTÎ*
Email : Newroz95@hotmail.com

Hejmar(64) Çirya pêşîn 2005 z-2617 k Buha (15) p|s

Li Şamê kurd û Ereb bi hev re….

Li – 16- ey meha çiriya yekê (oktober) 2005 – an , daxuyaniyeke dîrokî bi navê daxuyaniya Şamê (îlan Dîmeşq) dihate îmzekirin û hema pê re jî, ragihandin û Medya cîhanî û ya Erebî _ ji bilî ya rêjîma sûrî _ ev bûyera he dikirine manşêt û bi tîpên stûr bi xelkê temaşevan , guhdar û xwendevanan didane zanîn , ji bilî rûpelên malperan yên ku di sîngên wan de evê nûçeyê bi balkêşî cî digirt û di nav piraniya xelkê sûriyê de dibû ciyê kêfxweşî û hêviyan.

(JI BO GUHARTINA NIŞTIMANÎ YA DEMOKRATÎK)

ev daxuyana me hatibû bi navkirin û yên ku îmzên xwe avêtibûne binê wê ev partî , rêxistin û kesayetî bûn :

- Kombûna nişîmanî ya demokratîk li Sûriyê .
- Hevbenda demokrat ya kurd li Sûriyê .
- Komîteyên vejîna komelgeha Şaristanî .
- Berê demokratîk a kurd li Sûriyê .
- Parta pêşerojê (Şêx newaf el - BeŞîr) .

Birêz Riyad sêf (di girtîgehê de) - Birêz Cewdet se'îd -Dr. Ebdirezaq îd - Semîr el –Neşar , Dr. Fîda Ekrem el_Horanî , Dr. Adil zekar , Ebdilkerîm el_dehak , Heysem el-Malih , Nayif Qeysiyê .

Hêjayî gotinê ye ku , di pê weşandina daxuyaniyê re , hinde hêz , partî û kesayetiyên Sûrî yên dî jî , çi li hundir û çi li derve , piştgiriya xwe bi daxuyaniyê re dane **D.R(11)**

Mam Celala bi Kurdî axivî



Serokê Komara Iraqê birêz Mam Celal Talabanî li NewYorkê, di civîna giştî ya Neteweyên Yekbûyî de, bi zimanê kurdî axivî. Birêz Talabanî gotina xwe, bi erebî dets pê kir û di nîvî de, çend hevokên bi kurdî xwendin. Serok Talabanî bi kurdî got: "Birêzan, silavên xelkê Kurdistanê wek beşek ji gelê Iraqê li we tevan **dikim**." Birêz Talabanî herweha bi kurdî çend hevok li ser Kurdistana Iraqê gotin û diyar kir, bê çawa ew"nimûneyek e" ji bo demoqratî û azadiyê ye

www.arsivekurdi.org

Newroz Hejmar(64) Rûpel (2) Çirya pêşîn 2005z – 2617k

Nûçe û kurte nûçe

Pêşangeha Çiyayê Hunerî

Di roja 30 /9 / 2005-an de, bi vê navnîşanê (**pêşangeha Çiyayê hunerî**) di navenda rewşenbiriyê de , li bajarokê Cindirêsê , çiyayê Kurmênc (Efrînê) hatibû vekirin .Dora / 350 /kesî ji cemewerê Kurd lê beşdar bûn .

Di vê pêşangehê de / 90) hunermendên wêne , saz bi van renegên hunerî (Teşkîlî- Nehit – Kerîketêr – Fotogiraf- Saz). Di gel çend hunermendên Ereb (Se,id Yegen û Yeqûn Dulêmî..) tê de pêşkêş kirin .

Hêjayî gotinê ye ku, ev pêşangeh, sê rojan berdewame bû.

****

Kurd Û dadgeha Ewlekariyê

Dadgeha Ewlekariya Dewletê li Şamê pênc sal zindan ligel karên dijwar li siyasetvanê kurd Mehmud Elî Mihemed birîn. Siyasetvan Mehmud Elî Mihemed endamekî birêvebiriya Partiya Yekîtî ya Demoqrat a Kurd li Suriyê ye. Ew di 01.04.2005ê de hatibû girtin, piştî ku ji serdanekê li Kurdistana Iraqê vegeriya. Ew di 21.05.2005ê de serbest hatibû berdan û li hêviya dadgehkirina xwe mabû Û ji bo sedemên sivik, ceza wî kirin du sal û nîv. Û bilî wî jî dadgehê pênc sal zindan li du girtiyên Kurd Haşim Ehmed Ehmed û Şahîn Mihemed Husên birîn. Dadgehê herdu girtî bi "endametiya rêxistineke qedexe" û "hewildana perçekirina beşekî ji Sûriyê û girêdana wî bi welatekî biyanî ve" gunehkar kirin. Ev guneh ji bo hemî Kurdên ku, li pêşiya vê dadgehê beşdar dibin tên bikaranîn.

****

Rojiya Kevin

Fastîvalek bi navê **Rojiya kevin**, li bajarê Helebê li dar ket . Di 19/10/2005 an de, şevek taybet ji bo kevnetor û stirana Kurdî li dar ket. Di vê şevê de: 1-**Koma Kurdax** –Beşê reqsa zarokan . 2-**Koma Rojîn** ya reqsa gelêrî. Û hunermend 1-**Osman Can** 2- **Mihemed Welîd** 3- **Şêrîn**. Ev şev bi awaz û sema xemilandin.

Hêjayî gotinê ye ku, bîtirî 2000 mirov di vê şevê de beşdar bûn. Û li dawiyê, berpirsiyarên fastîvalê xelat li hemî endamên kom, hunermend û berpirsiyarên wan belav kirin.

www.arsivakurd.org

Nûçe û kurte nûçe

Nadiyê Efrîn bi serket

Careke din tîpa Efrînê ya gokê li hember tîpa Misfat Banyas bi [3 × 2] bi ser dikeve û ew û bi cemawere xwe ve bi kêf û şahiyeke bê hempa, ji lîstgeha Banyasê derdikevin .

Destpêka beramberkirin li aliyê Misfatê diçû . Lê di çend kêlîkên dawî de rewşa lîskê berve tîpa Efrînê zîvirî û piştî gelek êrîşan ji aliyê wan ve , bi ser tîpê Misfatê de , bi şêwekî tevane , ev serkeftî derket .

Lîstekvanên tîpa Efrînê yên ku gok kirine avêjwara Misfatê ev bûn :

Ebdilkerîm bobekî , Ela'I bêdon , Ibrahîm Hesen . Vê beramberkirinê hîşt ku tîpa Efrînê cîgeha yekê di giropa başûr de jî bistîne .

Em jî hêvî dikin we her tim serkeftî bibînin

****

Hunermend Seydo Reşo çû ser dilovaniya xwe

Seydo di sala 1960î de' ji dayîk dibe. Xewndia xwe ya bilnd li zanîngeha Şamê beşê El-finon El-cemêlê di navîna salên 80î de kuta dike. Li bajarên Şam, Heleb û Beyrûtê pêşangehan li dar dixe. Di sala 1990î de, berê xwe dide Romaniya. Li wir jî di pir pêşangehana de beşdar dibe . piştî 8 salan li romaniya, berê xwe dide Balçîka daku, li wir bi cî û war bibe. Lê, qedqrê tiştekî din dabû ber wî. Di 6ê Ber Çile de, li nexwaşxana ALAS – Biroksêl- dilê hunermedê Kurd S. Reşo disekine. Termê wî, di 14-10 an de, digihe Helebê. Bi beşdariya dost, heval, gundî û nûnerên tevgera Kurd li Sûriyê, di goristana gundê **Çema** de tê bin ax kirin.

Bi navê Komîta NEWROZ ê, em serê hemî berketî û malbata wî saxdikin

****

Dadgeha dîkteror S . Husên destpêkir

Yekemîn car e, di Rojhilata navî de ku, berpirsiyar û serokmarên dewletekê têne dadgehkirin. Dadgehkirina hovê herî bi nav û deng, di Rojhilata navîn de, li Bexdadê, bi cezayê kuştina 143 mirovîn Şî,î ji dundê Dicêl –Başûr- Tên dadgehkirin.



Bê guman, ev gunehkariya Sedêm ne ya bi tek û tenê ye. Belê, bi hezaran ji hemî gelên Îraqê, bi destê wî û hevalên wî hatine kuştin û di gurnên tevahî de hatine veşartin. Ew rêjîma diktetor, çekên kîmawî li bajarê HELEBÇE barabndin. Ji encama wê pênc hezar Kurd hatin kuştin û bi qasî wan jî hatin birîndar kirin. Bêtirî 8 hezar ji malbata BERZANIYAN bi destên wan hatin kuştin. Û li vê dawiyê, termê 513 şehûdên Bezaniyan li başûrê Îraqê, di gurnek tevahî de hatin tîtin.

Em bi hêvîne ku, dadgehkirina Sedêm li gorî gunehên wî û destlatiya wî be.

www.rojvakurdi.org

Zêr çiqas bimîne .... Hertim zêr e

Kurd dibêjin : **Ga dimre eyar dimîne , mirov dimire nav dimîne** .

Di dîroka gelê kurd de , gelek mirovên giranbuha hene . Ji nav wan , rewşenbîr û siyasetvanê gewre , bi nav û deng , Dr.Nûredîn zaza ye . Ji ber ku , mirovên gorbuhişt , mîna zaza , di dilê gelê xwe de , weke zêr hertim zindîne , wêlomê jî komîta rêvebir ya Munteda Nûredîn zaza , şevek ji bo bîranîna jiyana wî , li şamê , di 7/10/2005 an de , li dar xist . Dora 50 kesî, li wê şevê beşdar bûn . Ji wan nûnerên tevgera kurdî û di pêşî de , birêz Hemît Hec derwîş, serokê partiya Pêşverû yê Kurd li Sûriyê , gelek rewşenbîr û nûnerên rojname û kovarên kurd , Tilivizyona Kurdsat û gelek ronakbîrên Ereb mîna : Ekrem Bunî , Mîşêl kêlo , Cemal Ecloni û Me'az Hemûr nûnerê komîteyên mafên mirovan û komîteyên nûjenkirina civaka sêvîl li Sûriyê û H.W.D **.**

Pirograma şeva pîroz weha bû :

1- Kêlîkek bêdeng li ser giyana hemî pakrewanên demoqrasiyê û bi taybetî jî , li ser giyana nemir Dr. Nûredîn zaza hate rawestandin.

2-Danasînek bi kurdî û erebî ji kesayetiya hêja zaza re .

3-Danasînek bi kurdî û erebî ji xelata zaza ya salane re .

4-Xelatkirina mamoste Hemît Hec Derwîş weke siyasetmedarekî kurd , helbestvan Ferhad Îçmo weke rewşenbîrekî kurd û ronakbîrê ereb , dostê gelê kurd birêz Cad Ebdilkerîm El cûba'î

5-Danasîna bi erebî û kurdî ji hersê xelatdaran re .

6- Gotina xelatdaran ji bilî mamoste Cad ji ber nebeşdariya wî .

7-Gelek gotinên dî ji alyê nûnerê mamoste Xeyredîn Mûrad (Rêvebirê partiya Azadî) nûnerê mamoste Nesredîn , sekreterê partiya Elpartî (beşê di hevben de) , birêz Meş'el Temo rêvebirê teyar Elmusteqbel , Ekrem bunî Cemal Eclonî , Me'az Hemûr , Nama rojnama Newroz û gelekên dî .

Hêjaye em çend têban, ji hin gotinan berçav bikin :

Yek : Mamoste Cemal Eclûnî di gotina xwe de , weha got : Em hêvî dikin di careke din de , bi navê tevgera kurd yek gotin be .

Dudu : Rêzdar Hemît Hac Derwîş , ev şîret li beşdaran kir . Nezanbûnê zora Dr.zaza stand , yanê nezanbûnê zora zanebûnê bir .

Ez hêvî dikim , ji îro û pêve , hûn nehêlin nezanbûn zora zanebûnê bibe

Sisê : Em komîta rêvebir ya weşana Newrozê sipsiya komîta rêvebir ya Munteda zaza ya çandeyî dikin li ser ev ton çalakiyên bi nirx û hertim em jê re piştgirin .

Vaye li jêr emê kurtenama weşana Newrozê, di wê şevê de biweşînin

Newroznamе

Gelî guhdaran ! Dema we xweşbe.

Me vexwenama konîta D.r Nuredîn Zaza , ji ev reng komcivînê re ,li ba xwe weke weşana Newroz , bi gaveke bi cîh û bêlikirî binavkir . Lewre jî , ev bersivnama me ye.

D.R.(5)

www.arsivakurdi.org

Dumahîk : Newrozname

Guhdarên xoşewîst û birêz !

Nemir Nuerdîn Zaza , di danîna kevirê bingehîn di avahiya kurdbaweriyê de , xwedî roleke têbînkêş bû, tu kes nikare bibêje û rola wî tune û bincil bike . Li vacayî vê yekê kes , part , dezgehên nirxa mirovên mîna D.r Nuridîn Zaza bigirin gelek in . Me ji hêla xwe ve , weke malbata weşan a Nweroz , nirxa pakrewanê zindî (N.Z), ji roja roj ve baş naskiribû . Herweha , me di civata pêşîn , ji ya derçûna Newrozê de , biriyar wergirt ku, du wêneyên herdu stêrkên geş D.r (N.Z) û apo Osman Sebirî , di sînga weşana me Newroz de hildan û wewke nîşan ji xwe û xwendevanan re venan . *Gelî xoşewît û birêzan*

Li dawiya Buhara sal 1994an , cvîna derçûnê , ji weşana Newroz re hate girêdan . Tê de , biriyara weşana duheyvnameyî Newroz û bi zimanê Kurdî me wergirt. Ji wa rojê ve û ta ev roj , her du mehan hejmarek , li dû hevdu û bi rêk – pêk stêrka geş D.r(N.Z) bi bîra me dihate. Me jî , ji carekê pirtir , gotina D.r (N.Z) bi bîra dihanî û diweşand:

((Gelî Kurdan ! Eger hûn dixwazin tar – mar û winda nebin . Ji berî her tiştî , zimanê xwe bixwînin û bidine xwedin . Gelî Kurdan ! Eger hûn dixwazin xwe nasbikin û bi xelkên derdora xwe bidine naskirin ; dîsan jî , zimanê xwe bixwînin û bidine xwendin ..)).

Wisan jî , li ser riya dûr û dirêj , riya xebitandina peyv û nivîsandina bi zimanê Kurdî , zimanê D.r (N.Z) , me weke komîte , (63) hejmar ji Newrozê weşandin û ya (64) an jî , li rê ye . Di ber vê re , me weke komîte , bi pend û şîretên nemirê me yê hêja D.r(N.Z) baş girtibû. Me ziman dixwend û dida xwendin , li hemû navçe û herêmên kurdî nemaze li bajarê Helebê , bi dehan mamostên zimanê kurdî , li ber û ser destên me perwerde bûne û hê jî dibin.

Biserbilindî û şanazî em dikarin bibêjin , ew jî ji hêlên xwe ve, zimanê kurdî dixwînin û didine xwendin .

Li dawî , em dixwazin ji hemû guhdar û xwendevanan re bibêjin ku , D.r (N.Z) nemirî û namire . Çêtirîn nîşan û dubat, ji vê re -li vir- komcivîna mîna vê ye

Sipas ji baş guhdariya we re . Komîta Newroz:3/9/2005an

****

Dumahîka Birûska Nwerozê

kurdî di dil û hişên nifşên xwe yên nû de biçînin û dara wê av bidin, wan fêrî zimanê dayika wan bikin, wan fêrî hezkirin û rêzgirtina hev bikin, ji ber ko mezinên me gotine:" Hezkirina ziman ji hezkirina welêt e ..."

Bera destên we sax be birano, em mezinên xwe ji bîr nekin, mêjûya gelê xwe bi reşî û ronakên wê ve ji bîr nekin, jê sûde bigrin, ji ber ko, yê mêjûya wî tune be, paşeroja wî jî tune ye, û em hemî bi hev re, ji bo çand, tore û zimanê kurdî mil li mil kar û xebatê bikin.

Sed silav bo giyanê seydayê nemir Cigerxwîn.

Sed silav bo giyanê hemî rewşenbîrên me yên temenê xwe di ber, hebûn, ziman û doza gelê xwe de winda kirine.

Û sipas bo we hemiyan

Komîta NEWROZê 22-10-2005

www.arsivakurdi.org

Di bîranîna Seydayê Cigerxwîn de Şeveke toreyî li Qamişlo

Di bîrhatina 21-saliya koçkirina helbestvanê kurd ê navdar Cigerxwîn de, şeva 22-10-2005-an, kovara PIRSê şeveke toreyî li bajarê Qamişlo li dar xist. Birek ji rewşenbîrên kurd li şevê beşdar bûn, helbest û berhemên xwe pêşkêş kirin, û bi firehî li ser berhemên seyda û rewşa wêjeya kurd li Sûriyê bi tevayî axivîn.

Rezo, berhemeke dirêj li ser jiyan, helbest, çîrok û babetên dîtir ku seyda nivîsandine xistin bin ronahiyê û ji beşdaran re şirove kirin.

Konê Reş, helbestek bi navnîşana Cigerxwîn pêşkêşî şevê kir, û gotareke din jî li ser helbestvanê me yê gewre xwend.

Bavê Helbest, risteke xwe ya Kevin ku di sala 1984-an de, li ser koçkirina seydayê cigerxwîn nivîsandibû, pêşkêşî beşdaran kir.

Weşana Newroz, bi birûskekê tevlî şevê bûye, tê de li ser rola seydayê Cigerxwîn di geşkirina hestên netewî de axiviye.

Piştre, beşdaran nêrîn û bîrbaweriyên xwe li ser rewşa wêjeya kurdî anîn zimên. Bi belavbûna mêvanan re, nûnerên komîta PIRSê digel hin rewşenbîrên kurd, gurzek gul danîn ser gora seydayê nemir, û bi navê komîtê gotinek bi zimanê kurdî di deftera seredanan de nivîsîn .

Li jêr, em birûska Newrozê ji xwendevanan re diweşînin:

Birûska WeşanaNwerozê

Xwişk û birayên hêja...

Tevî ko me bi derengî bihîst, wê Kovara PIRS-ê şeveke toreyî di bîranîna helbestvanê kurd ê gewre û navdar CIGERXWÎN de, li bajarê Qamişlo li dar xîne, em xwe neçar dibînin ko bi dilgermî û dilsozî piştgiriya vî karê we yê pîroz bikin, da ko em hemî bi hev re, gurzek gul û beybûn deynin ser gora vî mirovê hêja , yê ko di dema tarî û tengasiyê de, mîna çiyayê Bagokê, li kêleka doz û zimanê gelê xwe rawestiya ye, bi mêrxasî, berevanî di ber mafên gelê xwe yên dadmend û rewa de kiriye...

Bêgomane ko, rola helbestên seydayê Cigerxwîn di hişyarkirina hestên netewî yên kurdî de, roleke mezin bû. Bi hestên xwe yên nazik, bi gotinên xwe yên şêrîn, Cegerxwîn karîbû raman û bîrbaweriyên kurdayetiyê bigihîne her mirovekî kurd, û helbestên wî, ser rûpelên dilan hatin nivîsandin û ezberkirin. Cigerxwîn, ketiye her maleke kurd, û cihekî xwe yê bilind û bi rûmet, di toreya kurdî de girtiye.

Seydayê Cigerxwîn, ne tenê mirovekî helbestvan bû, lê belê ew bîrewer, aqilmend, zaniyar û siyasetmedar bû, wî dîroka gelê xwe û toreya wî ya Kevin hûr hûr xwedibû, ji ber wilo jî, ew ji kurdan re bûbû dibistan...!

Di baweriya me de, wefaya sereke ji seydayê nemir Cigerxwînn re ew e ko em evîna zimanê **D.R (5)**

www.arsivakurd.org

Newroz **Hejmar(64)** **Rûpel (7)** **Çirya pêşîn 2005z – 2617k**

Tendirustî

Enflwenza tilûran

Bijîjkê Newrozê

1- Danasîn:
janeke veyrusî ye, bi tilûrên tîmarkirî û yên çolê dikeve, kane bi cureyêne ji dewaran jî keve, mîna berazan. Ew bi riya tilûrên pêketî digihê mirovan.

2- Veyrusa jandar:
ew jî mîna veyrusê mirovane, guhêzok e, kane her demekê xwe biguhêre, ji lewre jî aşla li dijî wê pir caran bê sûd e. Dehûpênc reng jê hene, ji H1 ra H15. Ev veyrus li ba tilûran bê rûdaw e, yan jî bi rudawên sivik derbas dibe. Tenê veyrusên H5 û H7 kane xwe biguhêre, pir xedar bibe, 100% ji tilûran bikuje û mirov jê vegrin.

3 - Ev jan di destpêka sedsala borî de li başûr rojhilata Asyayê hate naskirin, lê di sala 1997 an diyar bû ku kane mirovan jî vegre.

4- Di sala 2004 an de, creyê H5 li başûr rojhilata Asyayê li ba mirîşkan hate dîtin, û hate ragihandin ku çend pêketinên mirovan jê çê peydabûne. Ango, ew veyrus di riya tilûrên nexweş re, bi şêweyên yekser û neyekser kane bigihê mirov.

Çawa mirov janê vedigre: Di riya bêhnkişandinê re, ji bermahiyên tilûrên nexweş û derhênên alav bêhna wan. Ji bilî wê di riya çavan re di riya destgihandê, nemaze di mexberan de. Ta niha nehatiye naskirin ku mirov ji mirov vedigre.

Gengaze kî pir pêkeve?

- mirovên di tîmarkirina mirîşk û tilûran de dixebitin.
- Bazirgan û kesên bi tilûran re dixebitin.

5- Rûdawên nexweşiya Ênfilwenza tilûran:
Mîna rûdawên Ênfilwenzeya tund e: serma, kux, şewata poz û lûlikên bakêşê, dijwariya bêhkişandinê, gerbûna govde tevle êşekên masûlk û mofirkan, westan tevahî.

6- Derman: Dermanekî rasteras nîne, tenê rûdaw tên dermankirin û endamên guvde tên parastin.

7 - Xwevegirtin:
Parastina xwepaqijkirina kesane, mîna pakbûna dest, guvde, keskahî û meywe. Zor girênge ku goşt û hêlînên tilûrên tîmarkirî bixavî netên xwarin

****

Dumahîk : Rastî....Xeman hilmegre , min riya xwe baş naskirî , loman jî weha dikim . Dayê ! Gotina rast dibe bela serê mirov, wî li binê hepis û zîndanan digerîne û dike mêvan , wî penaber û windayî ango serê mirov dişkîne ! Lê dêmariyê , bi hêris dajote ser wî û digote : Bêçaro ! Tu çi dibêjî? Ciqas girîge rastî , eger tehil be jî , divê were gotin û pejirandin .

Wê bi tepan , li serê xwe dixist û gotinên xwe berdewam dikirin , digot: Wey xalî , li serê min bextreşê be, ma gelo ezê , bi çi rûyî herim ber serê, keçikên xelikê û ji vî bûdelî re bibime xwezgêncî ?

Bangîn bi rûkî berkenî , ber ve wê dihat û destên xwe , di ser serê wê re dixuşand û digot : Dayêcan hêdî , xwe pir hêrs meke û mexeyde . Eger tu dixwezî , ez xwedî gotina rast bim û di nava xelkê de serbilidî û bi rûmet bijîm weke tu û pir kesên dî dixwazin , navê Bangînê nezan û bûdele ji ser min rabe, nav û notikên dî li min bibin .

Bangîn xwe ji hevdu radikşand , dengekî blind bi xwe dixst û digot :Jinbav , de ka bersiva min bide , her kes baş dizane vaye bû du sal bavê min , ji malê dû re ; ma gelo ev zikê te roj ji rojê mezintir dibe , ji kû ve û cima! .

Hîngê Dêmarî hers dibe , sola xwe ji ling dike , di serê Bangînê bûdele de lêdixe , xwîn û xirarê bi serê wî ve dadirive .

Ew bi qîj û qêriniyeke bêhempa, ji malê dertê , bi nava gund dikeve . Gundî lê civiyane , hawara wî ye û dibase . gundîno min her tim digot , kesî çima ji min bawer ne dikir , hawar gundîno hawar hele werin hele werin , vaye rastiyê serê min şikand.

www.arsiv.kurdi.org

Newroz Hejmar(64) Rûpel (8) Çirya pêşîn 2005z – 2617k

Tenê bila bêjin:
Vaye em hene, hîn nemirine!!!

Dêrsim Elî

Îsal 2005 an, belavoka Newroz dehsaliya xwe derbas kir. Gava berî deh salan, me li hevalên xwe yên di serokatiya partiya xwe Yekîtî zor kir, da biryara biderxistina belavokeke bi zimanê Kurdî bistînin, çend armancên me hebûn. **Yek**: Tu belavok-rojname bi zimanê Kurdî der ne diketin, lewre me got emê bibin rêber û zêngil bi ustu bisîkê xin. **Didu**: Di serê me de bû, ew rojname xwendevan û nivîskarên zimanê Kurdî pir û jîrtir bike, zemîneke xwendekarî û fêrkirinê li ba xortan, nemaze hevalên me ava bike. Hêviya me pir bilind bû, ji ber ku, armanc jî hêja û bilind bûn.

Roja îro, piştî deh salan, zor pêwîste em li xwe vegerin, ji xwe pipirsin, kanî me ji wan armancan çi pêkhanîn ?

Bi ya min be, armanca yekê ta radekê pêk hat. Ji ber ku çend mihe ne çûn, belavokeke din binavê **Deng** biderket û ew jî ra niha berdewam dike. Lê belê di hêla pirkirin û çakirina xwendevan û nivîskaran, mixabin em bi ser neketin. Gava Newroz nû bû, xwendevanên wê hebûn, ew dixwastin, dixwendin û tê de dinivîsandin. Lê bi demê re jimara wan kêm bû, xwestek li ser Newrozê jî kêm bû û her çû çarçew teng bû. Yanê, digel ku tu serjimar li ba me nînin, lê diyar e ku em di vî warî de bi şûnd e çûne. Me nikanî xwe pêşd e bida. Li hêla din, me rê neda kesine din da şûna me bigrin û şopê bajon. Ez kanim bêjim, ta radekê, em, desteya birêvebirina Newrozê, di riya rojnama xwe de bûne kelem û asteng. Lewre jî gerek em rojekê pêşd e li xwe vegerin, rewşa rojnama xwe binirxînin û rê bidin bilî xwe. Belkî nifşekî nû kanibe xemleke nû li Newrozê bike û xwîneke teze pê de berde. Eger ji bo tenê em bêjin : Vaye piştî deh salan hîn em hene, nemirine! Em netenê dibin kelem, Newroza xwe jî perîşan dikin, rewşa zimanê Kurdî jî bi xwe re lawaz dikin. Ev jî berpirsiyariyeke giran e, em tev di ber de berpirsyar in. Mirov kane ta radekê bide, bixebite, tiştên nûjen û sûdar bafrîne, lê digihê radekê, eger mirov xwe têr û nû neke, kaniya afirînê ziha dibe, dimiçiqe, berhem lawaz dibin. Eger em rast bendewarê zimanê xwe yê şêrîn in û Newroza me li ber dilê me buha ye, gerek desteya birêkxistina Newrozê istîfa bike, daku hevaline nû tê de cih bigrin. Gava em serastkirin û nûjenkirinê dixwazin, gerekî berî em ji xwe de dest pê bikin. Di hin mejiyan de keysebaziyê lenger berdane, derdoran jehrikî dikin. Ew jî, bi bilî birînkarî û kewandinê derman nabe. Lê bila em şaş tênegihên, zor pêwîste her nivîskarek, xwendevanek, rewşenbîrek li kêleka Newroza xwe bisekine, pesena wê bike. Ziman zimanê me ye û Newroz zaroka me ye. 14-9-2005

www.arsivakurd.org

Newroz Hejmar(64) Rûpel (9) Çirya pêşîn 2005z – 2617k

pêşangeha Durist li Şamê

Şêx Birîmce

Di 5/10/2005 an de, li Şamê li meydana **Şehbende**r, nêzîkî seroktiya rûniştgeha şalyaran, li katjimêr11an, bi seden ji kurd û Ereban dixwastin bi rengekî şaristanî û aştî katjimêrekê li hev kom bibin. Dengê xwe li dijî şovîntî û rêzaniya ku rêjîma Sûryê, ji çil û sê salan ve li dijî miletê Kurd bikar aniye – hîn jî berdewame- wê rêzaniyê şermezar û riswa bikin.

Lê rêjîma Sûryê, li şûna ku ``di van rojên teng de`` serê xwe hinekî nerm bike, gotinên serokkomarê xwe berêz **Beşar el Esed** yê ku berî salekê soz da bû, ku vê babetê çareser bike, nasnama Sûrî li wan vegerîne, biryarên konfirasa partiya xwe ya Be`is bi cih bîne- ya ko tekane xwe xwediyê Sûryê dibîne- tev bi darê zorê ji katjimêr yazdan çarîkek kêm ve, dest bi belavkirina beşdarên ku dihatin li mêydana civînê bicivin, taromar dikirin, nedihiştin du-sê mirov li ba hev bicivin durişmên hatine nivîsandin bilind bikin.

li dawiyê, bi darê zorê xelk ji meydana Şehbender û derdora wê pereng-perengî kirin, û hat gotin: Hin ji leşkerên paristina rêjîmê bi dar û lepan li hin beşdaran dan û birêz **Mistefa Cim`e** endamê seroktiya **partiya Azadiya Kurdî** tilûyekî wî şikandin.

Bi vê reng danistandina hovane, rêjîm nikare royê bi bêjingê veşêre, vê doza ku ji çil û sê salan ve ji berçavê miletê Sûryê hatî veşartin veşartî bihêle, çareseriyek dadmend, jê re nebîne .Hêjayî gotinê ye ku: Ev cimawer tev li ser daxwaza û vexwendina **komîta hevxistina nîştimanî ya ji bo piştgirtina azadiyatîyên bingehîn û mafên mirovan li Sûryê** (Hevxistin/tensîq) ya ko di 2/10/2005 an de, daxwuynek li ser riya Enternêtê belavkirbû kombûn.

Hemî hêzin Kurd û Ereb yên ku bi rengekî aştî û sivîl dixwazin guhartinê di Sûryê de bi cih bînin, ev komît avakirine. Bêtirî 20 partî, komeleyên mafên mirovan, komîtên vejîna civaka sivîl li Sûryê tê de cih girtine, yanê hemî rêxistin û saziyên Kurd û Ereb tê de kardikin..

Dora 300 hezar Kurd ji hermafî bê par in û ta nasname ji wan hatî standin, zarokên wan li ba rêjîmê nayên nivisandin, nikarin bê erêkirina rêjîmê polekî jî bixwînin û ger xwendin û bawername standin, nikarin pê karbikin, piraniya wan di xwaringeh û razangehan de kardikin, lê bê rêdana polîsan ew nikarin li wir razin.

Yê bê nasname herdim nikare di nexweşxanên gîştî de, xwe dermanke....Malekê, firoşgeh, erebekê ji xwe re bikire, an li ser xwe dapike. EW tim cihê pirsînê ye, ger deh zarokên (wî an wê) hebin di kertên sor de xuya ye ku hînî êrgane jin ji xwe re naniye .Yanê bi kurtî ew ji her mafekî bê pare.

sexbirimce@yahoo.com

Şam 6/10/2005

www.arsivekurd.org

Destpêka saleke nû

Hersal, piştî encamên bekeloriya tên der, xwendekar û xwediyên wan dikevin pirs û gelegomeke mezin. Pirsgirêk sal ji salê mezintir û girantir dibe. Hîsal dîsa deriyên zanîngehê li deh hezaran qutabî hatin girtin û li derve man. Ne ji ber ku pileyên hemiyan nizm in û ne liyaqî xwendinê ne, na, ji siyaseta dewletê tê, dewlet siyaseteke perwerdeyî ye pir çewt dimeşîne, sal ji salê xirabtir dike, Qotabî jî temenê dindin. Eger em hîn bifkirin, welat teva ji ber biryarên dewletê yên çepel temenê dide.

Li Sûryayê, jerkî partiya Al-Be's textê dewletê standiye, biryarên paqij, li ser bingehek rastgoyî ku berjewendiyên welêt û welatî biparêzin netên stadin. Biryarek çiqas xuyan dibe ku li gor berjewendiya gel e, di paş de destên reş û berjewendiyên kesane yên gemarî hene. Em werin ser xwendina zanêngehî. Li gor destûrê dewletê, xwendin ji welatiyên Sûrî re belaş e. Lê dîsa jî, ji pêk anîna hin berjewendiyan tevane, ne xeme di ser destûr re were gav kirin û zanîngehên taybet vebin. Lê gerek ewên fermî bimînin belaş. Eger di hundur zanîngeha fermî de, hin qutabî bi peran jî bixwînin, xelkê wê jî qebûl dike. Lê ya ku hîç netê qebûlkirin, çima dê asta pileyên qebûlkirinê di zanîngehên dewletê de ewqas bilind bin, û ji zanîngehên taybet re nizim bin. Di vir de dîsa bîna kufkî ya dewletî û partiya El-Be's dikele. Di vê ton siyaset û biryarên di derbarî xwendinê di zanîngehên Sûriyê yên fermî de, du tişt tên dîtin. **Yek**, tiştên di destur de, di derbarî bêpretiya xwendinê de hene, berebere dev jê tê berdan. Hinbihin, deriyê zanîngehê dewletê li pêş kurên û feqîrfiqaran tê girtin û zanîngehên taybet şûnê digrin. Eger ne wilo ye, çima ewqas ferq di navbera pileyê ku zanîngehên fermî dixwazin û yên taybet de heye. Tekûze ku hevpariyek dê di navbera xwediyên zanîngehên taybet û perpirsyarê dewletê hebe. Ev jî ji sinciyên parta Be's û berpirsyarên dewleta asayişane ye. Yên dibin qurban, li ber lingan derin zarokên me ne, em in, gel e, paşeroj e, welat e. Birastî hêviya gel di vê destlatê de hîç nemaye, hatiye birîn. Eger rojê deh kirasan biguhre, hemî alavên ragihandinê jî jê re bidin defê, sed zibalcî jî. 28-9-2005

Rastî Seriyan dişkîne.

Dîlan Zivigî

Bangîn hîn zarok bû , diya wî çûye dilovaniya xwedê û ew li ber destê dêmariyê mezin dibe . Wisan jî , pir kêm bi kesên derdora xwe re daxife , kêm caran nêrînên xwe , di babet û bûyeran de xûya dike . Ew bi gelemper hertim dibêje :Ez nizanim ! Vêca jî , di nêv xelikê gund de, bi Bangînê nezan û bûdele têye naskirin

Rojekê dêmariya wî, jê re digot : Bangîn! Kurê min! Va ye, tu mezin bûye û gihaye ciyê xort û mêran . Ma çêdibe ? Tu ji hemû tiştan re bibêjî, ez nizanim . Pêwîste, tu xwedî nêrîn bî, tiştên rast û ne rast ji hevdû cuda bikî û ji rastiyê re bêjî , ev rast e ! Kuro ma tu dizanî ku , xelikê gund ji te re dibêjin : Bangînê bûdele . Bangîn bi dengekî bilind dikeniya û digot : Dayê! **D.R.(7)**

www.arsivakurdi.org

Dumahîk : Kurd û .....

3- Belavkirina nûçeyên derewîn.

Gelo: Armanca şoreşa Pêximberan, Îngilîz 1628, Emerîka 1773, Firansa 1789, gelên Efrîqiya, Asiya, Emerîka Latîn û ya P. Be,s çiye?!.Ne ji bo rizgarkirina mirov ji zordarî û koletiyê ye?!. Daku, ew mirov azad , serbest û bi rûmeta xwe ya mirovane bijî ?!. Lê, armancên şoreşa P. Be,s ji yên tevan cuda ne?!.

Xala 306 an weha dibêje: Avakirina her komeleke ji bo guhartina laşê dewletê ya aborî an civakî an jî rewşên bingehîn yên civakê bi şêweyên di xala 304 an de . Ev komele tê pişaftin û endamên wê bi cezayê karên dijwar tê tewanbar kirin.

Xala 304 an weha dibîje: Karên teror, hemî karên tirsê dixe nav milet, wek çekên Teqîn, şer, kîmawî, jehir, cersomî....?!.

Vêca gelo: Belavkirina daxuyaneke ji raya giştî re, bi şêwekî şaristanî û aştiyane, an sekandineke aştiyane , li Şamê , ji bo vegerandina nasnamê, bi rastî karine teror in?!.

Kîngê daxwaza vegerandina nasnama Sûriyê bûye, berçiqandina yekîtiya nîştimanperwerî ?!. Û serjimara awerte li parêzgeha Hesekê nûçeyeke derwîne?!.

Û tevgera Kurd ji sala 1957 an ve, li Sûriyê ne aşkere û hevdîtinan bi partiyên rikber û Be,s li dar nexistine ?!.

****

Dumahîk : Li Şamê...

xuyakirin û biryara tevlêbûnê dan . Ji nav wan ; parta biraderên misilman li sûriyê (cema't el-îxwan el-mislimîn fî Sûriya) , parta kar a komonîst li Sûriyê , Dr. Birhan Xelyon serokê navenda lêkolînên Erebî li Parîsê û Dr. Heysem Menna ji rêvebiriya Federalîzma navnetewî ya rêxistinên mafên mirovan ….Hwd.

Di dîroka Sûriyê de , eve cara yekemîn e ku evqas hêz dikarin li hvdu bikin û dest bi karekî giring bikin , di nav xelkê xwe de li beramber rêjîma Ba's , rêjîma tek-partî ya sergerim , malxur û Şoven , civîn û semîneran li darxin , dûrî xwînrêtinê , bi şêweyên aştiyane doza guhartina demokratîk , wekhevî û mafên mirovan , çareserkirina pirsa kurd bikin . Loma jî , daxuyaniya Şamê li ba gelê me yê kurd li sûriyê ciyê rêzgirtin û piştgiriyê ye, parta me jî , bi dilsozî û bi her hawî lê xwedî derdikeve û eger hinde têbînên rexneyî bona zengînkirin û xemlandina vê daxuyanê hebin jî , ew her dê ciyê rawestin û rêzgirtinê bin .

Sînorê Yekta

****

Karîketêr mijara şevekê li Şamê bû

Duh li Şamê, li taxa Kurdan, li katjimêr 7:30 an, bi hebûna cimawerkî taybet ji rewşenbîr, nivîskar, helbestvan, zimanhez, şevek hunerî li darket.

Dora du katjimêran me, bi hunermendê Kurd **Durust** re borand, bê ku haya me ji demê hebe, çawa dem bi lez li me dibore , şevbuhêrik li ser banîkî bû, bayekî payîzî hênik berê xwe dabû me, lê germiya mijarên hunermend em germkirin, hêşt ko em li dem û sermê hay ne bin; me guhdaran nedixwest şev were kuta kirin, lê sîstema komîtê ko şev ji du katjmêran derbas ne be, şev kuta kir.

www.arsivakurd.org

Kurd û dadgeha ewlekariyê

Reşoyê Pîrê

Di 23 ê Tebaxa 1962 an de, destlata Sûriyê, bi seroktiya Nazim Qudsî, zagona serjimara awerte – hejmar 93 - ya herî şoven û ne mirovane ji, bo Kurdên -parêzgeha Hesekê- derxist. Ev zagon' di 05 ê Çirya Pêşîn 1962 an de, bi karhat. Ji encama wê, bêtirî Sed hezar Kurd' li wê parêzgehê bê nasname kirin.Û ta nuha jî' ew zagon berdewme. Hêjayî gotinê ye ku, Ev zaogna awerte, ne ya bi tek û tenê ye, belê pir zagonên awerte yên din jî li Sûriyê ta nuha berdewam in.

Tevgera Kurd li Sûriyê, bi her awî xebitî û dixebite – di riya gadgeh, perleman, wifdên gelêrî li ba barêzgehê Hesekê, berpirsiyarê şaxa partiya Be,s li Hesekê, şalyarê hudirî, qesra komarê û ....- daku, encama vê zagona şoven rak e û mafên wan hemwelatiyan bi cî bibin. Lê, mixabin destlata Sûriyê tu carî derd, kul û êşa wan nabîse û li serê xwe siwar bû ye , tu dibêjî qey ev zagon li ser hêvê bi kar hatiye?!..

. Ji destpêka damezrandina P . D. K li Sûriyê, sala 1957 an ve, tu carî zîndanên welêt bê xebatkarên Kurd ne bûne. Bi Sedan zîndan dîtine. Lê, pir kêm ji wan pêşkêşî dadgehan kirine. Û yên pêşkêşî dadgehan jî, bi van gunehan tewanbar dibûn.

1-Dijîtiya pêkanîna armancên şoreşê, li gorî mofirka (H) ji Elmersom Elteşrî,î hejmar - 6 - yê di 07/01/1965 an de derketiye.

2-Li gorî xalên– 306 – 304 ji zagona cezayê

Endamtiya rêxistineke veşartî û hewladana birîna parçak ji zeviyên Sûriyê û girêdan wî bi dewleteke biyanî ve – li gorî xala 267 ji zagona cezayê. D.R(11)

Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê Kurd re yên di girtîgehên Sûriyê de

www.KurdSyria.org